

MEDRESEYA KURDÎ û DILQÊN WÊ DI PÊŞKETINA VÊJEYA KURDÎ DE

Zeynelabidin Zinar
Swêd/Stockholm

Puxte:

medresê rolekê mezin d jiyanî rewşenbîrî û siyasîya kurdistanêda hebû, çunkî ev cihe li jêr kartêkirin û karîgerîya kumelgeha kurdîda bû, û ew rêbaz û pertûkên têda dihatne xwandin têkhelek bûn j rêbaz û têgehestina kurdan bo babetên zanistî û kartêkirina dewrûberan li ser kurdan, anku bi rêka medresê şaristanyeta kurdan di gel milletên di têkhele bûn. herwesa d evan medreseyan da bo êkem car zaminê kurdî keve ser kaxezê û li paşerojê bo jêderê hizra neteweyî ya kurdî.

Peyvên Serekî: *Medrese, Menhec, Civakê Kurdistanê, Elî Teremaxî, Extebî*

Ev e 1070 Sali in ku ew saziya bi navê Medreseya Kurdî hebûna xwe li Kurdistanê domandiye û xwe li Rojhilata Navîn kiriye hoçka zanîn û zanistiyê. Wê saziyê gelek jî, ji bo bipêşxistin û geşemendiya Çanda Kurdî suxre kiriye.

Gelo ew sazî çi tişt bû, çi dikirin û tê de çend texlît şaxên zanistiyê dihatin xwendin?

Mixabin heta niha jî naveroka Medreseya Kurdî bi awayekî rêkûpêk nehatiye zanîn û ji bo nivîşên Kurd ên demê zelal nebûye.

Ew nezelaî jî, ji ber ku ev e dused sal in ziman û çanda kurdî hatine tepeserkirin û jixwe di Sedsala Bîstî de jî, li Bakûrê Kurdistanê bi giştî hemû heyînen Kurdan hatine qedexekirin, bînpê bûne, hatine perçiqandin û gelek medrese hatine şewitandin. Ji ber hindê, derfeta rewşenbîrên Kurd çênebûye ku ew karibin vê saziya bav û kalên xwe rind binasin û bi nivîşên xwe yên nûhatî bidin naskirin.


Bêguman naveroka Medreseya Kurdî pir berfireh e, hem jî pir kûr û hûr e.

Ji ber hindê têgihîştina wê jî, ne karekî hêsan e.

Îro agahdariya rewşenbîrên Kurd bi xwe jî, zêde li ser Medreseya Kurdî tune. Ji xwe agahdariya rewşenbîrên cîranên Kurdistanê weke yên Tirk, Ereb û Faris hema bêje ji binî tune. Ji ber ku ew, Medreseya Kurdî wek saziyeke zanistiyê napejirînin.

Yan eger ew li ser Medreseya Kurdî rawestiyabin jî, li ser şopa hin baweriyên cuda û bi dîtinên çewt tevgeriyane û Medresê bi paşverûtî û bi kevneperestî

nirxandine. Îcar ji ber hindê, min pêwîstiya nivîsandina pirtûkek bi navê “Xwendina Medresê” dît û piştî ew lêkolînên ku li serê hatine kirin, ew tiştên ku min bi xwe dîtine, tev nivîsîn û wek pirtûk di 1993an de li Stockholmê daye çapkirin.



14- Zeynelabidin Zinar, Xwendina Medresê, Kurdî/kurmancî, Şrovekirin, Pencînar Weşanxaneya Çanda Kurdî, Sverige/Stockholm, 1993, 100 rûpel, ISBN 91 972090-2-3

Demekurtek piştî derketina vê pirtûka bi navê Xwendina Medresê, bala pir kesan ketiye ser Medreseya Kurdî û lêpîrsîn ji aliyê wan ve hatiye kirin. Piştî ev pirtûk li Zanîngeha Sorbûnê (Parîs) û li yeke Londonê jî wek berhema dersê ji bo xwendevanên înglîz û fresiyan hatiye bikaranîn.

Di 1998an de jî li Parîsê esnîtûyeke Navnetewî bi navê INSTITUT NATIONAL DES LANGUES ET CIVILISATIONS ORIENTALES, LES ANNALES DE L'AUTRE ISLAM, No 5, kurtiya vê pirtûkê hem bi zimanê îngilîzî û hem jî bi zimanê frensî nivîsiye û xistiye pêşiya pirtûkeke 400 rûpelî, bi navê “Islam des Kurdes” (2) û weşandiye. Herweha wêneyê bergê pirtûka Xwendina Medresê jî li ser bergê pirtûka Islam des Kurdesê hatiye bicihkirin. Piştî derketina vê pirtûkê, hîn zêdetir bala saziyên çandî û zanistiyê yên Ewrûpê ketiye ser Medreseya Kurdî.

LES ANNALES DE
L'autre Islam

N°5

Islam des Kurdes



PUBLICATION DE L'ERISM
EQUIPE DE RECHERCHE INTERDISCIPLINAIRE
SUR LES SOCIÉTÉS MÉDITERRANÉENNES MUSULMANES

PARIS - 1998

■ INSTITUT NATIONAL DES LANGUES ET CIVILISATIONS ORIENTALES ■

Islam des Kurdes
Les Annales de l'Autre Islam, n° 5
INALCO - ERISM, Paris, 1998

**MEDRESE EDUCATION IN NORTHERN
KURDISTAN¹**

Zeynelabidin ZINAR

Kurdish medreses of the traditional type, prominent especially in northern Kurdistan for many centuries and long were the most important centres of education and cultural transmission, no longer exist. By the end of the 1960s, the last ones had disappeared. The present article addresses a growing interest in these institutions and attempts to answer questions as to what these medreses were, how they functioned and what method of education was followed in them. The history of the flourishing and demise of these medreses has so far not been presented clearly to the Kurdish public.² Very few Kurdish intellectuals have been aware of the medrese tradition; even fewer have a more than superficial acquaintance with it. Interest in the medrese and the learned culture associated with this institution is increasing, however, and many members of the Kurdish educated and artistic elite wish to know more about the subject. So far, however, researchers have not given it much attention and not a single serious study has been produced. Although a few texts have been written on the subject, most of them have grave shortcomings, are marred by mistakes and are based on hearsay. Those who did write about the medrese, moreover, frequently did so according to their own, different world views and convictions, judging the medrese to be a hotbed of backwardness and reaction. Therefore I thought it necessary to write this brief essay in order to present the readers with what that I have seen with my own eyes and experienced personally.

¹ This article is an abbreviated version of the author's *Xwendina medresê* [Medrese education] (Stockholm: Pencinar, 1993). It was translated from Kurdish and edited by Martin van Bruinessen, who also added the footnotes.
² This is true of northern (Turkish) Kurdistan but much less so of the Iranian and Iraqi parts. Important studies in Sorani were published by Mihemmed Mela Kerim and 'Alî al-dîn Sajjâdî.

Islam des Kurdes Institut Nasional Des Langues Et Civilisations Orientales Les Annales De L'autre
Islam, no 5. Paris 1998

MEDRESE ÇI YE?

KENGÊ MEDERESEYA KURDÎ DERKETIYE HOLÊ?

Berî her tiştî pêdivî ye ku bê gotin ku peyva "Medrese"yê, peyveke erebî ye, ango cihê dersê.

Kesê ku ders dide jî, bi kurdiya kurmançî jê re dibêjin SEYDA.

Ev peyv ji beşa peyvên dupeyvî ye û ji SEY û DAYê afiriye.

Di kurdî de peyva SE yan jî SEYê, navê dersê ye. Peyvika DAYê jî, lêkera dayînê ye. Yanî kesê ku ders dide.

Nemir Ehmedê Xanî jî vê peyvê di berhema xwe ya bi nave Nûbihara Biçûkan de bi kar aniyê û weha gotiye: *"Se Ehmed senake bi qewlek sehîn..."* (89/2- Nûbihar, Ehmedz Xanî, Kurdî, Roja Nu, kurdî, Sverige/Stockholm, 1986, 80 rûpel, ISBN 91-767201-7-9. Tîpguhaztina ji alfabeya erebî: Zeynelabidin Zinar.)

Çewa ku tê zanîn, medrese cara pêşî li bajarê Medîneyê, di sala 622yên Zayînê de avabûye. Piştê her ku çûye, medrese li hin welatên ku ola Îslamê pejirandine jî, hatiye vekirin. Lê belê di wan medreseyan de tenê perwerdehiya olî û hinek jî ya leşkerî hatiye kirin.

Medreseya pêşî li Kurdistanê, di sala 950 de li bajarê Hemedanê vebûye û demekurtek şûnde jî, Kurdên demê gelek şaxên zanistiyê tê de bi cih kirine û wek zanîngeha demê bi kar anîne. Piştê şaxên Medreseyê li herêmên kurdnişîn belav bûne.

Rewşenbîrê pêşî ku ji vê Medreseyê derketiye jî, Baba Tahir Hemedanî (938-1020) bûye.

(Ji Baba Tarih Hemedanî re, çendî ku "Baba Tahir Uryanî jî" hatiye gotin, amac ji vê yekê dîrxistina wî ji nijada kurdî bûye. Mînakên wisa ji bo hin zatên Kurd ên di jî ku hatine gotin hene: Ji bo Mewlana Xalid Nexşebendî Şarezorî dibêjin "Mewlana Xalid el Bexdadî.") Medreseya Kurdî li Hemedanê:

https://www.wikizero.com/tr/K%C3%BCrtlerin_%C4%B0slam%27a_ge%C3%A7%C5%9Fi

DILQÊN MEDRESEYA KURDÎ

Medreseya Kurdî gelek rewşenbîrên derdemî derxistine holê û dilqên mezin bi wan daye kirin. Wan rewşenbîran, di pêşveçûna gelek waran de, bi taybetî jî ji bo netewî karên hêja kirine. Herweha piraniya rewşenbîrên Kurd, xwe berpirsyar dîtine û piraniya wan jî, berpirsyariyên xwe bi cih anîne.

Bêguman çaxê meriv li mêjuya miletan dinere, bi hêsanî tê dîtin ku ev dewlemendiya ziman, çand û çareserkirina doza wan a siyasî, bi piranî ji aliyê zanayên olî ve çêbûye. Yanî miletên ku Fileh in, sazgeha wan a perestînê dêr e û zanayên wan ên olî keşe û pitrik in. Yên ku Cihû ne, kenîşt û yên Bisilman mizgevt û medrese pêşkêştî jib o xelkê xwe kirine. Helbet ev yek ji bo Kurdan jî lêbar bûye û her wisan jî çêbûye.

Ji sala 1639an ve Kurdistan ji aliyê siyasî ve desthelatiya xwe wenda kiriye. Çendî ku li herdu beşên Kurdistanê gelek mîrektiyên Kurd hebûne jî, lê wan bê destûra Împeratoriya Osmanî û ya Sefewî çalakiyên derveyî nekirine. Lê êşkere ye ku ew herdu împeratorî hetanî 1925an jî, nikaribûne Kurdistanê bi temamî têxin binê çavdêriya xwe. Ew astengiya mezin li pêşberê wan împeretoriyan, bêguman di radeya yekemîn de Medreseya Kurdî bûye.

Serhad Bapir - Hunermendê şêwekariyê Kurd

Peymana Qesra Şêrîn a dabeşkirina xwezaya Kurdistanê di navbera Sefewî û Osmaniyan de.
<http://huneruraman.blogspot.com/2015/08/>

Berxwedan û serhildanên Neteweyê Kurd, heta van salên dawiyê jî, çi kesê yan hêza ku dest bi şerê Azadiyê kirine yan mela bûne, yan jî şêx bûne. Ji şêxan jî, bi piranî peyrewên Rêçika Neqşebendî bûne.

Çendî ku ev e li dora 300-400 salî ye ku Neteweyê Kurd nebûye xwedanê dewleta xwe ya siyasî. Lê belê dîsan jî Kurdan ziman, tore û hebûna xwe parastîye. Ew parastin jî, bi çar saziyan çêbûye:

- Medreseyên Kurdistanê.
- Sîstema Eşîrtiyê.
- Sîstema Şêxantiyê.
- Dîbistanên Zindî (Çîrokbêj û Stranbêjên Kurd.)

Eger ne ew çar saziyan bûya, niha aqûbeta Qibtiyên Misrê hatibû serê Kurdan jî.

DESTPÊKA MEDRESEYA KURDÎ

Li pêşî hatiye gotin ku Medrese li Kurdistanê di sala 950 de, pêşî li Hemedana paytext vebûye. Lê dema desthelatiya Siltanê Kurd Selahedîn Eyûbî (1138-1193) Medreseya Kurdî hatiye guhertin û tê de gelek şaxên zanistiyê bi cih kirine û wek zanîngeha demê hatiye domandin. Piştî şaxên wê, hin bi hin li piraniya herêmên Kurdistanê hatine vekirin û perwerdehî di wan de hatiye kirin. Di wan medreseyan de, ji xwendekarên Kurd zêdetir yên faris, Ereb û wekî din ji nijadên cuda xwendine.

Piştî ku Siltan Selahedîn ew guhertin xistine Medreseya Kurdî, îcar gelek rewşenbîrên mezin jê derketine holê û wan şeqla xwe li mêjûyê xistine.

Selahedîn piştî eynî projeya Medreseya Kurdî bîriye Misrê û li Cami-’ul Ezherê jî bi cih kiriye.

Piştî Peymana Amasyayê (1514) ku di navbera Mewlana Idrîs Bedlîsî (1452/57-1520) û Selîmê (1470-1520) ku piştî bûye siltanê Osmanî de çêbûye, di Medreseyên Kurdî de gelek xwendekarên Tirkman û Terekeme jî perwerde dîtine.

ŞEWITANDIN û RÛXANDINA MEDRESEYÊN KURDÎ

Dema desthelatiya Siltan Selahedînê Kurd û piştî wî jî, xasma jî ew bipêşveçûna Medreseya Kurdî, li hesabê hin hêzên dijmin neçûye. Ji ber hindê, di Sedsala 13,14 û 15yan de, piraniya wan Medreseyên Kurdî ku şûna zanîn û zanistê bûne, hatine şewitandin û talan bûne.

- Di sala 1250 de, medreseyên li herêma Diyarbekir, Xelat, Şarezûr û Hewlêrê, ji aliyê Mogolan ve hatine şewitandin.

<https://www.turkcebilgi.com/mo%C4%9Fol-istilas%C4%B1>

Moğol İstilası 1250

- Ji 1386 hetanê 1403, Kurdistan di destên leşkerên Tîmorleng de maye û di serê pêşî de Medreseyên Kurdî şewitandin.

<https://tr.wikipedia.org/wiki/Timur>

Timurleng (1336-1405)

- Ji sala 1501 hetanê 1736an, Medreseyên Kurdî ku ji ber şewitandina Mogol û Tîmorleng filitîbûn jî, vê carê ji aliyê Sefewîyan ve hatine şewitandin.

Sê şahên Sefewî, ji ber ku Kurd baweriya Şîatîyê nepejirandine, bi hezaran serê Kurdan bi şûr jêkirine û di wê navê re piraniya medreseyên Kurdî jî şewitandine.

Şahên ku Kurd qetlîam kirine, ev bûne:

Şah Îsmail Sefewî (1487-1524)

Şah Tahmasp Sefewî (1514-1576)

Şah Ebbas Sefewî (1571-1629)

[https://tr.wikipedia.org/wiki/I. Abbas Şah Ebbas Sefewî \(1571-1629\)](https://tr.wikipedia.org/wiki/I._Abbas_Sah_Ebbas_Sefewi_(1571-1629))

<https://www.haberler.com/sah-ismail/biyografisi/> HABERLER: Şah İsmail Sefewî (1487-1524)

https://tr.wikipedia.org/wiki/L._Tahmasb Şah Tahmasp Sefewî (1514-1576)

<https://islamansiklopedisi.org.tr/safeviler> İKLOPEDİSİ: Qetliama Kurdan u Rojhilata Navîn.

Ji ber hindê ye ku Mewlana İdrîs Bedlîsî û Selîmê ku piştî bûye Sultanê Osmanî, di 1514an de, peymanek bi navê Peymana Amasyayê, li ser bingeha biratî û hevkarîya Kurd û Tirk îmze kirine. (http://ku.wikipedia.org/wiki/Peymana_Amasay%C3%AA)

Ew Peymana biratiya Kurd û Tirk, 125 sal bêkêmasî domandiye. Lê di 1639an de Îcar Sefewî û Osmanî bi Peymana Qesra Şêrînê, axa Kurdistanê di navbera xwe de dabeş kirine. Bi wê yekê bêhîzûrî ketiye nêv Medreseya Kurdî jî.

<https://www.sorubak.com/blog/1639-kasr-i-sirin-antlasmasi-maddeleri.html>

SORUBAKCOM

1623-1639 Osmanlı-İran Savaşını

Kasr-ı Şirin Antlaşması maddeleri, Kasr-ı Şirin Antlaşması özelliği, Kasr-ı Şirin Antlaşması hangi padişah

Piştî vê peymanê, ew Medreseyên Kurdî yên ku li aliyê Osmaniyan mabûn, hetanî dawîya Sedsala 18an jî, jiyana xwe di binê desthelatiya mîrên Kurd de domandine.

Lê mixabin di Sedsala 19an de, astengî ketine pêşîya Medreseyê Kurdî. Sedsala 20î jî, ji xwe hem ji bo Kurdan û hem jî ji bo Medreseya Kurdî, wek Sedsala Reş hatiye binavkirin.

....

Hêjayê gotinê ye ku, Mele Seîdê Kurdî (Bediuzzaman) 800 sal piştî Siltan Selahedînî, xwestiye ku eynî projeya wî di Medreseya Kurdî de bi cih bike. Lê mixabin desthelatiya Sitenbolê ew tawanbar kiriye, pêşî avêtine girtîgehê, piştî jî avêtine tîmarxaneyê.

<http://www.pencinar.se/listapirtukan.html>

103/16- Jiyana Mele Seîdê Kurdî, Ebdurehman Norsî, kurdî, Pencînar Weşanxaneya Êanda Kurdî, Sverige/Stockholm, 1996, 140 rûpel, ISBN 91-972090-6-6. Wegera ji zimanê tirkî: Zeynelabidin Zinar.

....

Li jorê behsa Sedsala Reş hate kirin.

Di vê sedsalê de, xasma jî ji 1926an bigir hetanî sala 2002yan, Rejîma Kemalîzmê bi hovîtiyeke mezin êrîş bîriye ser medreseyên kurdî û berhemên bi zimanê kurdî kirine tune. Xasma jî di dema wan cuntayên leşkerî bi taybet 1961, 1971 û 1980yî de, gelek berhemên kurdî hatine şewitandin.

Îcar dema meriv li mêjûyê mêzedike, tê dîtin ku Medreseyên Kurdî û berhemên bi Zimanê Kurdî, ji aliyê van çar hêzan ve hatine şewitandin:

YEK: Leşkerê Mogolan. (1250)

DIDO: Leşkerên Tîmorleng (1386–1403)

SISÊ: Împeretoriya Sefewî (1501-1736)

ÇAR: Rejîma Kemalîzmê. (1926-2002)

Rejîma Kemalîzmê dema medreseyên kurdî şewitandine, Kurdên li herêma tev kom kirine û agir li ber çavên wan bera medreseyan dane.

Demekurtek piştî derketina pirtûka min a bi navê *Xwendina Medresê*, bala pir kesan kete ser *Medreseya Kurdî* û lêpîrsîn ji aliyê hin zaneyan ve lê hatine kirin. Ev pirtûk li Zanîngeha Sorbûn (Parîs) û li yeke Londonê jî wek berhema dersê ji bo xwendevanên inglîz û frensiyan hatiye bikaranîn.

Bêguman pir kesên zana û rewşenbîr, ji şaxên cuda yên Medreseya Kurdî derketine ku hêjayê pesn û serbilindiya Neteweyê Kurd in.

Di Medreseya Kurdî de ji zarûkên Kurdan zêdetir hin kesên Turkman, Çerkez, Erebb û Faris jî xwendine.

Îcar bi hêza wê Medreseyê ye ku ev e bi sedê salan e, zimanê kurdî xwe bi reşbelekîyan ve rûqalê mêtû kiriye û rewneqa xwe pêşkêşê mirovatiya dinyayê kiriye.

Projeya robot û computerê ku îro ev herdu bûjen dinyayê li ser nigan ragirtine, ji aliyê rewşenbîrê Kurd Smail Cizîrî (1136-1206) ve di Medreseya Sor a li Cizîra Botanê hatine çêkirin.

<https://www.youtube.com/watch?v=x3DO3nhaulo> Bernameyeke televizyoni li ser Ismail Cizîrî

Hin ji wan medreseyan pîrî ku menşûr bûbûn, bihêsanî navên xwe di rûpelên mêtû de jî bi cih kirine. Ev e çend ji wan medreseyan ev in li jêrê:

Medreseya Amêdiyê

Medreseya Axtepeyê

Medreseya Bazîdê

Medreseya Bêdarê

Medreseya Çûxreşiyê

Medreseya Farqînê

Medreseya Findika Botan

Medreseya Hawêlê

Medreseya Heskîfê

Medreseya Hîzanê

Medreseya Miksê

Medreseya Norşênê

Medreseya Oxînê

Medreseya Paloyê

Medreseya Qerekoyê
 Medreseya Şemdîzan
 Medreseya Sêrtê
 Medreseya Sitrabasê (Diyarbakir)
 Medreseya Sor (Cizîra Botan)
 Medreseyên Bedlîsê wek Îxlasiye, Katibiye, Şukriye, Şerefiye û Şemsiyeyê.
 û bi sedan medreseyên wisa yên din...

Di wan medreseyan de ji xwendina bi zimanê kurdî-erebî û hinek jî zimanê farisî zêdetir, Zimanê Rûsî û yê Yûnanî jî hatine xwendin.

BICIHANÎNA TOREYA NIJADÎ

Medreseyên Kurdî devera bicihanîna tore û rêveçûna kurdariyê jî bûye. Di wan de wergirtin û edetên kurdewariyê dihatin bikaranîn û şexsiyeta nijadî hertim tê de hatiye parastin.

Lê piştî 1925an, Mistefa Kemalê Makedonî bi navê "Kanuni Tedrisat" ew medreseyên kurdî dane girtin. Yekemîn sedemê girtina wan Medreseyên Kurdî ev bû; heşifandina Kurdan û qutkirina Kurdan ji her tiştên wan yên kev, xasma bêxeberhiştina Kurdan ji mêjû û pêşiyên wan. Jixwe amaca yekemîn a Mistefa Kemêlî bi derxistina qanûna "Kilik-kiyafet"ê jî ev bûye, da Kurd dest ji wergirtina xwe ya milî berdî û kincên kurdî li xwe nekin.

Kurdistan cara pêşî jixwe diyar e ku di 1639an de hatiye dabeşkirin. Lê ji wê demê heta 1923an tu carê Faris û Osmaniyan Kurd û Kurdistanê nikar û mandela nekirine û bi qanûnên taybet heşifandina Kurdan bo xwe nekirine armanc. Lê piştî 1923an ku bakûrê Kurdistanê spartin Tirkîyê, îcar karbidestên dewleta Komarê li pêşberî dîrokê her cûre xirabî kirine û heta niha jî dikin. Çendî ku di van salên dawîn de li hin cihan bi navê "Medrese"yê hin xwendîgeh vebûne, lê ew jî ji aliyê dewletê ve têne xwedankirin.

Bêguman pir kesên mezin ji wan medreseyên Kurdistanê derketine ku di nava neteweyê xwe de, hem jî li Rojhilata Navîn û li gelek welatên dinyayê, xasma jî li cîhana îslamî navûdeng dane û di pîşeya xwe de pir menşûr bûne. Ew kesayet, çi di warê olî û rêçikan (Terîqet) de be, çi di warê siyasî û serokatiya serhildanên netewî de be û çi jî di warê zanist, vêje û helbestvaniyê de be, karên pir hêja kirine. Wek nimûne, navê çend ji wan kesan li virê ev in:

- Ehmedê Xanî (1651-1707).
- Elî Herîrî (1010-10789).
- Elî Teremaxî (Sedsala IV, hicrî).
- Feqiyê Teyran (1590-1660).

- Mela Ehmed Cizîrî (1570-1640).
- Melayê Bateyî (1417-1491).
- Mele Mehmûd Bazîdî (1797- ?).
- Mele Seîdê Kurdî/Norsî (1878-1960).
- Mele Ūnis Herqetênî (1785-?)
- Mele Xelîlê Sêrtî (1753-1843).
- Mewlana Xalid Kurdî (1773-1826), hîmdarê duyemîn ê Rêçika Nexşebendî bûye.
- Mûrad Xanê Bazîdî (1772-1832).
- Pertew Begê Hekarî (?.. -1806).
- Selîm Silêman (Sedsala 16-17).
- Şerîfxanê Colemanî (1693- 1748).
- Şêx Diyaedîn/ navdarê bi Hezretê Norşênî (1855-1923)
- Şêx Ebdulqadir Nehrî (1908- ?)
- Şêx Evdîrehman Axtepî (1850-1910).
- Şêx Seîdê Pîranî (1865/66-1925)
- Şêx Ubeydulah Nehrî (1826/28-1883)
- Seyîd Taha Nehrî (1853- ?)
- Xaris Bedlîsî (1758-?) û gelek kesên wisa yên di...

Çendî ku ji 1925 heta 1938an, Medreseya Kurdî bi awayekî hovane hatiye perçiqandin jî, lê piştî dema pir neçûye dewletê dîsa xwestiye ku wan medreseyan veke û tîxe binê çavdêriya xwe.

Bêguman li Bakûrê Kurdistanê vekirina wan medreseyan li gor zagona heyî qedexe bûye jî, lê dewletê hin bi hin fersend daye ku vebin. Piştî 1940î li hin herêmên Bakûrê Kurdistanê medrese vebûne û perwedehî di wan de hatiye domandin. Lê belê wek caran, dîsa jî her tişt bi tersê daxwaza dewletê hatiye domandin.

Ew medrese di dawîya salên şêstî de ji ber deka û dolabên Kemalîzmê, hem ji ber tengasiya rewşa demê, hinek jî ji ber rewşa nûjen a mercên dinyayê, hinbihînin teqla xwe sist kirine û di salên heftêyî de ketine nava pêlên deryaya dîrokê û tê de nixro bûne.

Îro gelek rewşenbîrên Kurd hene ku zêde agahdariya wan bi rewşa wan medreseyan nîne ka çewa bûne, xwendina di wan de bi çi awayî hatiye domandin û ev e hezar sal in ku wê saziyê bi çi rengî xwe li ser nîgan radigirt! Herweha pir kes hene ku niha meroqeke zêde jî dikin û dixwazin ku bizanibin ka ew medrese çi bûne, çi dikirin û çewa lipikîne.

Hin kes jî hene ku dixwazin li ser wan medreseyan lêkolîn bikin, rewşa xwendina di wan de derxînin holê û bi Raya Giştî bidin zanîn. Lê ji ber nebûn an kêmbûna agahdariyên li ser vê babetê, karê wan hîn bêtir dijwar û zehmet bûye.

Ev yek jî eşkere ye, heta niha tu kesî yan sazî û rêxistinekê, hewl nedaye ku li ser medreseyan lêkolîn bike û rewşa wê xwendina kevnare bi nifşên nû bide zanîn.

Ji ber hindê, ev çalakiya ku Zanîngeha Zaxoyê li ser Medreseya Kurdî kiriye, şanaziyeke mezin e û hêjayê pîrozkirinê ye.

Bêguman çî kesê yan çî civata ku serpêhatiya xwe ya bihurî nizanibe û paşeroja xwe neyîne ber çavan, ew nikare pêşeroja xwe jî sererast bike.

Rewşenbîrên Kurd ên kevnare vê saziya medreseyê wek pîroziyeke xwe ya nijadî parastine, nifş bi nifş anîne ta ku gihandine dema îro û xistine destên rewşenbîr û siyasetmedarên nûjen ên dema vê cîhana nûjen.

Bêguman, çewa ku her welatek an her neteweyek li gor tore, edet û rewşa xwe di demên bihurî de xwendine û ku niha jî her wisa dixwînin, bi zimanê xwe dinivîsin û dipeyivin, berê li Kurdistanê jî perwerde bi zimanê kurdî, hinek bi kurdî û erebî çêdibû. Ew xwendin bi sedsalan her wisan hatiye domandin...

ŞAXÊN ZANISTIYÊ YÊN MEDRESEYA KURDÎ

Neteweyê Kurd ji serê Sedsala Yazdeh hetanî serê Sedsala Hijdehan, di medereseyên xwe de gelek şaxin zanistiyê yên cuda dixwendin, hinek ji wan ev in li jêrê:

- 1- Serf û Nehwa Erebî
- 2- Tefsîra Quranê
- 3- Hedîsa Pêxember
- 4- Ilmê Mentiqê
- 5- Edeba Behsê (tewrên axaftinê)
- 6- Hawayên Xweşbêjîyê (waz û nesîhet)
- 7- Ilmê Belaxetê (ragîhandin)
- 8- Ilmê Kelamê
- 9- Ilmê Hikmetê
- 10- Ilmê Qanûnê
- 11- Ilmê Feraizê (hiqûqa mîratê)
- 12- Ilmê Wehdaniyetê (eqîde)
- 13- Ilmê Usûlê
- 14- Ilmê Heyetê (astronomî û astrolojî)
- 15- Ilmê Tendurustiyê
- 16- Ilmê Hesabê (matematik)

17- Ilmê Felsefê

18- Ilmê Siyasetê

19- Ilmê Leşsaxiyê

Piraniya van şaxanên zanistiyê her çiqas ku bi Zimanê Erebi dihatin xwendin, lê Kurdên dersdaran ew tev werdigerandin Zimanê Kurdî û dersa şagirdên xwe didan.

Herweha çend pirtûkên ku xwerû bi zimanê kurdî / zaravayê kurmançî ne jî, bi dersîti di Medreseyan de dihatin xwendin.

Tiştêkî din ku zêdetir bala mirov dikişîne ev jî heye ku nivîskarên piraniya wan pirtûkên bi Zimanê Erebi yên ku di medreseyan kurdî de dihatin xwendin, Kurd bûne. Ev rastî jî eşkere ye ku hewesa mele û xwendekarên Kurd, zêde ji pirtûkên ku nivîskarên Erebi û wekî dib bûne re, çênedibû.

DESTPÊKA XWENDINÊ

Ji destpêka xwendina Medreseya Kurdî çi feqetî be, çi meletî û rewşa xwendinê be, herweha navên pirtûkên ku di Medreseyan de dihatin xwendin û navê nivîskarên wan pirtûkan diyar bikim, hêvî ev e ku ev xebat sûd bigehîne rewşenbîr, lêkolîner, kurdolog û zanîngehên ku dê li ser babeta Medreseya Kurdî lêkolîn bikin.

Ji destpêka Xwendina Medresê heta ku dawî li xwendinê tê, weha ye:

- Destpêka Xwendina Zarûkan:

Ev xwendin di sawiya dibistanê de ye û di temenê 5-6 salan de çêdibe.

- Destpêka Feqîtiyê: Ev xwendin di sawiya mekteba navîn û lîseyê de ye.

- Destpêka Talibtiyê: Ev xwendin di sawiya zanîngehê de ye.

Di xwendina Medreseya Kurdî de derbaskirina awayê wek pol û salan tune, lê xwendina jimareke kifş a pirtûkan heye ku jê re XWENDINA RÊZÊ tê gotin.

Xwendina van Pirtûkanên Rêzê wek zeman, di 15 û 25 salan de kuta dibe. Şagirdêkî jêhatî û zîrek, dikare di 15 salan de jî kuta bike.

Lê eger şagird ne jêhatî be, belkî Xwendina Rêzê di 20 û heta 25 salan de hêj kuta nebe.

Piştî ku dawî li xwendina Destpêkê tê, îcar dor tê ser Wergirtina Îcazeyê (destûrname) Xwendinê.

Piştî wergirtina destûrnameya Medreseya Kurdî, şagirt dibe xwediyê van keysetan: Mafê meletiyê bi dest dixê û dikare dersa şagirdan bide.

Îcar kesên ku meletî dikin û ders bidin şagirdan, dibin du nivş:

1. Meleyên Heftilmî.

Tê zanîn ku wî kesî di Medreseya Kurdî de heft şaxên zanistiyê xwendine.

2. Meleyên Duwazdehilmî:

Tê zanîn ku di Medreseya Kurdî de duwazdeh şaxên zanistiyê dixwendiyê.

BIHNVEDAN Û BERBIHÊLÎ

Di Medreseya Kurdî de, disiplîneke pir hişk hebû, kesê ku xwe li ber wê disiplînê ranegirtiba, nikaribû bixwîne.

Di hemî medreseyan kurdî de, berpirsekî îdarî hebû, jê re *mîr* dihate gotin. Ew Mîrê Medresê jî, bi hîlbijardin dihate destnîşankirin. Gelek caran dersdarê medresê jî, bêgav dima ku bi xebera mîr bilipike.

Di Medreseya Kurdî de bihnvedan roja pêncşemê piştî nivro dest pê dikiri û roja îne piştî avabûna rojê bi dawî dibû.

Di rojên bihnvedanê de kesî dest nedida pirtûkan, şagirdan tenê kêf û henek û laqirdî dikirin, bi şevan jî reqs û bêlimte û leyztikên cuda dikirin.

Hin caran şagird diçûn geştê; kar û berx dibirin çolê, li ber kaniyekê an li keviya çem û çayekê serjê dikirin, goşt dipijandin/diqelandin û tevî savarê dixwarin.

HER XWENDEKAREK MÎNA KURÊ MALÊ BÛ

Li Kurdistanê cihên ku Medreseya Kurdî lê hebûna, her malbateke Kurd xwe bêgav didît ku alîkariya xwendekarekî Medreseya Kurdî bike. Her xwendekarek dibû wek kurê malekê. Wê malê çewa kurê xwe xwedî dikir, xwedîtî li wî xwendekarî jî dikir.

Gelek car eger keça wê malbatê hebûna, piştî keça xwe jî dida wî xwendekarî.

MEDRESEYA KURDÎ DADGEH BÛ

Medreseya Kurdî ji karê xwendin û perwerdeyê zêdetir, eynî dem wek dadgeh jî kar dikir; hemû gelş û sergêjiyên civatê çareser dikir.

Dersdarê medresêyê û çend rîspiyên gund, digel du-sê xwendekarên medresêyê yên Talib, hemû doz û gelşên gundiyên Kurdistanê bi navê "şerî'et"ê çareser dikirin. Lê gelek car çareserî li gor Toreya Kurdan dihate kirin.

PIRTÛKÊN XWENDINA RÊZÊ

Pirtûkên ku di Medreseya Kurdî de dihatin xwendin, ji destpêkê heta dawiyê, ji wan re Pirtûkên Rêzê tê gotin.

Xwedina medresêyê, bi tîpên erebî dibû. Tê de ji sed pirtûkî zûdetir dihatin xwendin. Herweha piraniya wan pirtûkên ku dihatin xwendin jî, bi Zimanê Erebi bûn. Babetên wek *Serf û Nehwa* erebî, Fiqh, Hedîs, Tefsîr, Mentiq, Îstî'are, Mûnazere, Usûl, Eqîde, Cebir û hwd...

Li virê ji destpêka xwendinê heta ku Xwendina Medresê kuta dibe, navê hin pirtûkên ku dihatin xwendin, ev in li jêrê:

- 1- ELÎFBÊTIK, fêrbûna destpêkê ya bi tîpên erebî. Lê Kurdan tîpa P, Ç, G, V, G, J lê zêde kirine û li gor Fonetîka Zimanê Kurdî sererast kirine.

- 2- QUR'AN: Ji misilmanan re pirtûka asîmanî ya herî pîroz e û xwerû bi Zimanê Erebi ye (bi devoka Qureyşî hatiye nivîsandin). Di vê pirtûka pîroz de 114 sûret lê belê derbarê Ayetan de çendî ku cudatî heye, lê bi piranî tê gotin ku 6666 ayet hene. Quran, li 30 pişkî hatiye parvekirin. Ji her pişkekê re *cizû* tê gotin. Di her cizûyekê de jî çar beş hene û ji wan re *hizb* tê gotin.
- 3- MEWLÛDA KURMANCÎ: Piştî kutakirina xwendina Qur'anê, Mewlûda Kurmancî tê xwendin. Mewlûda Kurmancî ango jidayikbûna Mihemed Pêxemberî (sxl). Bi naveroka xwe serpêhatî ye ku Melê Bateyî tê de hin bûyerên dîrokî yên li gor baweriya îslamê diyar kirine.
- 4- NÛBIHARA BIÇÛKAN (NÛBAR): Ferhengoka mamosteyê nemir a Ehmedê Xanî ye (1651-1707) ku bi helbestkî, hem jî bi kitejimar û qafiye, bêjeyên erebî û kurdî bi rengê ferhengok nivîsiye. Xanî çewa ku wî bi xwe di paşîya Nûbiharê de gotiye, wî ew berhem di 11-ê Adara 1094-an (1683) de nivîsiye.
- 5- NEHC-UL ENAM: Bi naveroka xwe baweriya (Eqîde) ola îslamê ye û ji aliyê Mele Xelîlê Sêrtî (1754-1843) ve hatiye nivîsandin.
- 6- EQÎDEYA EHMEDÊ XANÎ: Çewa ku ji navê wê jî tê zanîn ev berhem, baweriya ola îslamê ye ku mamosteyê nemir Ehmedê Xanî ew bi helbestkî û bi zaravayê kurmancî nivîsiye. Tê de 73 malik hene, hemû bi kêş û qafiye û bi yazdeh kiteyan dikişin.
- 7- XAYET-UL ÎQTISSAR. Xwerû bi Zimanê Erebi ye.
- 8- ÎBNÛ QASIM, nivîskarê wê Îbnû Qasim Kurd bûye û xwerû bi Zimanê Erebi ye.
- 9- BACÛRÎ, nivîskarê wê Îbrahîm Bacûrî Kurdî bûye, xwerû bi Zimanê Erebi ye.
- 10- TESRÎFA KURMANCÎ: Ev pirtûka bi zimanê kurdî li ser Serfa (Kişandina lêkeran) erebî ji aliyê Mele Elî Teremaxî ve hatiye nivîsandin. Kesê ku vê pirtûkê dixwîne, hemûyî jiber dike.
- 11- EMSÎLE: Pirtûk bi Zimanê Erebi ye û li ser Serfa erebî hatiye nivîsandin.
- 12- IZZÎ: Pirtûk bi Zimanê Erebi û li ser Serfa rebî hatiye nivîsandin.
- 13- EWAMILA CURCANÎ: Ev pirtûk bi naveroka xwe Nehw (rêziman) e û bi Zimanê Erebi hatiye nivîsandin. Navê nivîskarê wê, Ebdulqadirê kurê Ebdurehman ê Gurganî (Kurd) ye.
- 14- ZURÛF (AMAN): Ev pirtûka bi zimanê kurdî, li ser Nehwa erebî ji aliyê Mele Ênisê Erqetênî (Kurd) ve hatiye nivîsandin.
- 15- TERKÎB: Ev pirtûka bi zaravayê kurmancî, li ser Nehwa erebî ji aliyê Mele Ênisê Erqetênî ve bi zimanê kurdî hatiye nivîsandin.
- 16- SE'DULLAHA SEXÎR: Ev pirtûka xwerû bi zimanê erebî, şerha 'Ewamila Curcanî ye ku Nehwa Erebi bi awayekî berfirehtir daye nasandin. Çewa ku ji navê wê jî tê zanîn, nivîskarê wê Se'dullah SEXÎR (Kurd) e.
- 17- ŞERH-IL MUXNÎ: Ev pirtûka Nehwa erebî xwerû bi Zimanê Erebi hatiye nivîsandin.
- 18- S'EDÎNÎ: Ev pirtûka Serfa erebî xwerû bi Zimanê Erebi hatiye nivîsandin. Herweha ew şerha pirtûka Izzîyê ye. Nivîskarê wê Se'dê Tevdezanî Kurd bûye.
- 19- HELL: Pirtûk bi naveroka xwe Nehwa Erebi ye û bi erebiyeke pir hişk hatiye nivîsandin.
- 20- SE'DULLAHA GEWRA: Pirtûk bi naveroka xwe Nehwa Erebi ye û bi zimanê erebî, ji aliyê Se'dullah Gewre (Kurd) ve hatiye nivîsandin.
- 21- NETAIC-UL EFKAR, Felsefeya Grekî (Yunan) ye û bi Zimanê Erebi hatiye wergerandin.
- 22- SIYÛTÎ. Xwerû bi Zimanê Erebi ye.
- 23- CAMÎ, xwerû bi Zimanê Erebi ye û ji aliyê Mewlana Camî ve hatiye nivîsandin.
- 24- MUXNÎT-TULAB, mentiq e û bi Zimanê Erebi ye.

- 25- ÎSAXÛCÎ, mentiq e, nivîskarê wê Mele Xelîlê Sêrtî ye.
- 26- QEWEHMED, mentiq e û bi Zimanê Erebi ye.
- 27- 'USSAMA WEDD'Ê: Pirtûk, xwerû bi Zimanê Erebi ye; rewş û tertîba çêkirina tiştan dide zanîn.
- 28- 'USSAMA ÎSTÎ'ARÊ: Pirtûk xwerû bi Zimanê Erebi ye, rewş û tertîba çêkirina tiştên ne heqîqî (mecaz) dide zanîn.
- 29- ŞERHA WELÎD: Pirtûk xwerû bi Zimanê Erebi ye, bi naveroka xwe Mûnaqeşe û Munazzere ye.
- 30- HAŞIYA EBDULWEHAB xwerû bi Zimanê Erebi ye.
- 31- HAŞIYA 'USSAM xwerû bi Zimanê Erebi ye.
- 32- HAŞIYA EBDULHEKÎM xwerû û bi Zimanê Erebi ye.
- 33- ŞERHŞEMSÎ, mentiq e. Nivîskarê wê, Se'dê Tevdezanî Kurd e.
- 34- MUXTESSER, felsefe ye, nivîskarê wê, Se'dê Tevdezanî Kurd e.
- 35- ŞERH-UL EQAÎD: Pirtûk xwerû bi Zimanê Erebi ye, rewş û rêveçûna hemû baweriyên beyan dike û li dinyayê çiqas cûre bawerî hene tevek nivîsîne. Nivîskarê wê, S'edê Tevdezanî Kurd e.
- 36- CEM'IL CEWAMI': Pirtûk xwerû bi Zimanê Erebi ye, bi naveroka xwe 'İlmê Usûlê ye; ji destpêka xwendinê hetanî vê pirtûkê, pirtûkên ku bihurîne kurteya hemiyan diyar kiriye. Tê gotin ku nivîskarê wê Kurd e.
- 37- ŞAFÎ (İlûxet): Pirtûk xwerû û bi Zimanê Erebi ye.
- 38- ÎMTÎHAN (Nehw): Pirtûk xwerû bi Zimanê Erebi ye.
- 39- EBÛTALIB (Nehw). Pirtûk xwerû bi Zimanê Erebi ye.
- 40- ÎBNÛ 'UQEYL (Nehw). Pirtûk xwerû bi Zimanê Erebi ye.
- 41- TESSRÎFA EREBÎ (Serf), nivîskar: Mele Elî Kurd bûye û xwerû bi Zimanê Erebi ye.
- 42- QIZILCÎ (Serf): Pirtûk xwerû bi Zimanê Erebi ye, nivîskarê wê Kurd bûye.
- 43- QEREDAXÎ (Serf) Pirtûk xwerû bi Zimanê Erebi ye nivîskarê wê Kurd bûye.
- 44- DÎWANA MELAYÊ CIZÎRÎ. Pirtûk bi zimanê kurdî ye.
- 45- MEM Û ZÎNa Ehmedê Xanî: Pirtûk bi zimanê kurdî ye.
- 46- RÎSALA HEMÎDÎYE: Pirtûk bi Zimanê Erebi ye.
- 47- ŞERHA LUBABÊ (Nehw): Pirtûk bi Zimanê Erebi ye.
- 48- SITÛR, çêbûna Tiştan beyan dike, bi Zimanê Erebi ye, lê navê wê bi kurdî ye ango mezin û qelew.
- 49- RÎSALA WED'Ê, Rewşa Çêbûna tiştan beyan dike, bi Zimanê Erebi ye.
- 50- RÎSALA ÎSTÎ'ARÊ: Mecaz û teşbîhan beyan dike, pirtûk bi Zimanê Erebi ye.
- 51- SILÊMANÊ KURDÎ, Şerî'et: Pirtûk bi Zimanê Erebi ye. Ji aliyê Silêman Kurdî ve hatiye nivîsandin.
- 52- TENWÎR-UL QULÛB, Tesewuf e, ya şêx Mihemed Emînê Hewlêrî ye.
- 53- ÎRŞAD-UL ÎBAD, Şerî'et, Şêx Zeynedînê kurê Ebdulezîz ê Milêbarî (kurd) nivîsiye, bi Zimanê Erebi ye.
- 54- FETAWA ÎBNÛ HECER, şerî'et, îbnû Hecer bi Zimanê Erebi nivîsiye, heşt cild in.
- 55- MÎNHACUTTALIBÎN: Pirtûk bi Zimanê Erebi ye.
- 56- MUXNÎ-L MUHTAC, şerî'et, çar cild, şerha Mînhacê, bi Zimanê Erebi ye.
- 57- FETH-UL MÛÎN, şerî'et, bi Zimanê Erebi ye.
- 58- ÎANETUT TALIBÎN, şerî'et, çar cild in, bi Zimanê Erebi ye.

- 59- BÛCEYREMÎ, şerî'et, çar cild in, bi Zimanê Erebi ye.
- 60- EL TEQRÎR bi Zimanê Erebi ye.
- 61- EHYA-UL 'ULÛM bi Zimanê Erebi ye.
- 62- ÎRŞAD-UL ÎBAD, şerî'et e, bi zimanê kurdî ji aliye Xelîfe Ûsiv ve hatiye nivîsandin.
- 63- TEFÎSÎRA CELALEYN ya Quranê.
- 64- TEFÎSÎRA SAWÎ ya Quranê, çar cild in.
- 65- TEFÎSÎRA CEMEL, ya Quranê, pênc cild in.
- 66- TEFÎSÎRA QAZÎ BEYDDAWÎ ya Quranê, çar cild in.
- 67- TEFÎSÎRA ÎBNÛ KESÎR, ya Quranê çar cild in.
- 68- TEFÎSÎRA KEŞAF ya Quranê duwazdeh cild in.
- 69- TEFÎSÎRA MENAR ya Quranê yazdeh cild in.
- 70- TEFÎSÎRA FEXRÊ RAZÎ ya Quranê.
- 71- TEFÎSÎRA XAZÎ ya Quranê.
- 72- TEFÎSÎRA REMEL ya Quranê.
- 73- TEFÎSÎRA MUHMEL ya Quranê.
- 74- DURRET-UL WA'IZZÎN ya Quranê.
- 75- RIYADDUS`SALIHIÎN bi Zimanê Erebi ye.
- 76- DELÎL-UL FALIHÎN, heşt cild in.
- 77- MUSLIM hedîs e.
- 78- BUXARÎ hedîs e.
- 79- ÎBN-UL MUXTESSER.
- 80- TACUR`RESÛL pênc cild in.
- 81- NÎHAYET-UL BÎDAYE.
- 82- TEZKÎR-UL QURTEBÎ.
- 83- FETAWA HEDÎSÎYE.
- 84- NÛR-UL EBSSAR.
- 85- XERPÛTÎ, ev pirtûka bi zimanê erebi, bi navê kevn ê Elezîzê ye.
- 86- EL QERSÎ, ev pirtûka bi zimanê erebi bi navê bajarê Qersê ye.
- 87- SIYERUN`NEBÎ hedîs e.
- 88- QISSES-UL ENBIYA.
- 89- MUHEMMED RESÛL.

Berî ku dawî lê bê, ji van 89 pirtûkên ku bi rêzê nav û babeta wan li jorê hatiye nivîsandin zêdetir, 24 pirtûkên din jî hene ku di Medreseya Kurdî de dihatin xwendin.

Îcar li gor dabeşkirina şaxên xwendinê ev 89 pirtûk weha ne:

- 36 pirtûk, fêrkirina ziman û gramatîk in.
- 14 pirtûk ên alîkarên dersê ne.
- 12 pirtûk ên şerî'etê ne.
- 11 pirtûk ên Tefsîra Qur'anê ne.
- 13 pirtûk ên Hedîsê ne.
- 3 pirtûk ên Siyerê ne.
- 24 pirtûk klasîkên kurdî ne.

TEVEK: 113 pirtûk

المدارس الكُردية ودورها في تطور الأدب الكُردي

الملخص:

كانت للمدرسة دور كبير في الحياة الثقافية والسياسية في كُردستان، وقد أثرت تلك المناهج الدراسية التي كانت تدرس في المدارس الكُردية في المجتمع الكُردى كونها تعبر عن ماهية هذا المجتمع، وكانت هذه المدارس هي الملتقى الرئيس بين حضارة الكُرد والتأثيرات الحضارية الاقليمية للأمم المجاورة. كما كانت لهذه المدارس دوراً كبيراً في نقل اللغة الكُردية من مرحلة الشفاهية الى مرحلة الكتابة والتدوين، فكانت لهذه المدارس الفضل الأول في الكتابة باللغة الكُردية بعد ما كان الكُرد يكتبون باللغات العربية والفارسية والتركية. تلقى هذه الدراسة الضوء على هذه المدارس، متى ظهرت في كُردستان؟ ما هي مناهج الدراسة فيها؟ كيف كان تأثيرها في المجتمع؟

الكلمات الدالة: المدرسة، المناهج، المجتمع الكُردى، علي ترمماخي، اختبى

Kurdish Schools and their role in the development of Kurdish literature

Abstrac:

The school had a great role in the cultural and political life in Kurdistan, and those curriculum that were taught in Kurdish schools have affected the Kurdish community as they express the nature of this society, and these schools were in the main meeting place between the Kurdish civilization And regional civilizational influences of neighboring nations. These schools also had a major role in transferring the Kurdish language from the oral stage to the writing and codification stage, so these schools were the first semester in writing in the kurdish language before the Kurds were writing in Arabic, Persian and Turkish .

This study sheds the light on these schools, when did they appear in Kurdistan? What are their curriculum in them? How was its impact on the society ?

Keywords: School, Curriculums, Kurdish Community, Ali Tirmakhhi, Khtalab

